Helbest di nava çend peyvan de

Dildar Yasir

Berî ku ez çend gotinan di vê gotarê de binvîsim, min dixwazt bi dirêjî vî babetî bigrim dest û bibêjim ku helbesta niha di nava qolincên zayinê de ket û lefteke bêhempa dike, ji ber ku heger em berê xwe bidin helbesta kurdî di vî caxî de, em dibînin ku helbest gehiştiye qûnaxaek serketî, lê gelo heta çi astî em ji vê helbestê razî ne û boçi her wextî helbestek bi hêz dernakeve pêş çavên xendevanên helbesta kurdî?

Ji bo ku mirov şîroveya helbestekê bike, gerek e mirov biçe di kûrayiya wê de bigere û nihêniyên wê yên veşartî bibîne, helbest ango xwarina derûn û hestdana dil, ku di meziniya xwe de deryayan hembêz dike û dikare bi çend peyvan xwe bigehîne wan dirên veşartî yên hundirê mirovan. Mirov, demê dixwîne, hest bi mestiya giyanî dike û bêhemd derbazî cîhanek din dibe, ku serkêşiya wê helbest dike, heta niha jî çi dem ji helbestê re nehate dayin wek mijarên din yên toreyê, derveyî hinek helbestên ku taybet bin, bi hinek rûdanan ve û hêza xwe ya wêjeyî ji wê bûyera ku li ser diaxve û dihîhe ser ziman, tenê ew helbestên ku wan qûnaxan bi şêwekî dîrokî şîrove dikin û behsa wan qehremanan dikin, em dikarin demî têde bibînin ji ber ku ew helbest dîrokî ne û dîrokê tomar dikin, lê her wextî em dibînin ku helbest ne sînordar e, bi cih û demî ve, ew li ku dibe bila bibe her ew deme û her ew cihe, gelek caran dema ku em parçekî helbestê dibînin û dixwînin, em di bêjin ku ew ji bû min hatiye nivîsand, an ku em dibêjin ev helbest nehîniyên hindirê min dixwîne, lê di rastî de ew peyvên ku têne dariştin nava kaxezê û berî ku xwedanê wan biweşîne û bibine sermaya her kesekî û li her derekî , ew zaroka xwediyê xwe ye ku hîna

ne hatiye şîrvekirin, lê demê ku hat û mîna baranek nîsanî ji asmanan barî û her kesê xwand, wî wextî em dibêjin ku ew bû hest, raman û hizrên gerdûnî.

Vêca, eger me werin û helbestekê bixwînin, bi çavek hûr berê xwe bidinê, em dê bibînin ku ew helbest ji gelk aliyên xwe ve wan hestên veşartî derdibire û wan wêneyên ku di xeyala me de û her wextî em di xewnên xwe de dibînin dihîne berçavê, lê ew rastiyek e berûvajî ye û gotinên wê wek sihrê bo mirov dihên, lewra jî mirovan di qûnaxên berê de ji helbestvanan re digotin kesên sihrmend û xwedan şiyanên veşartî. Ji ber ku ew peyvên di hundirê helbestê de peyvên şêrîn in û her kes jê hez dike û dibêje ev bo min hatiye nivîsandin- heger em dur bikevin ji wateya wê ya ku helbestvan bi xwe wate dayê- .

Demê ku tu di bûyî şevistan
Û te xatira xwe ji rojê dixwazt
Peyvên mirî li dor min digeriyan
Û tu rêwî dibûyî
Berî ku roj biçe ava…
Û çend hezar salên din
Ezê xewna hezkirina te binivîsim
Dibe ku rojekî ji rojan tu şiyar bibî
Berî roj ava, tu xatirê ji min ne xwazî
Dibe ku tu peyvek nû bibêjî
Dibe ku rojekê ji rojan
Berî roj ava, hezkirneke nû
Li bajarekî din bo min bibêjî."

Bê guman, ku helbest wê her wê reseniya xwe biparêze û dê her wê ciwaniya di hundirê peyvên xwe de bi dewamiya vê jiyanê re berdewam bike, lê gelo xwendevan dê her ew xwendevan bin, ku wek caran helbest bibe cihê dilxweşiya wan û bi helbestê re biaxvin û xwe têde bibîn, yan helbest û xwendevandê bi hev re werin jibîrkirin?